

## Çiyayê Kurmênc Reş Girêda

Di 17ê Berçele de, li ser riya Heleb-Hesekê, di bûyerê de, mamosteyê bi nav û deng: Reşîd Hemo jiyana xwe wendakir.

Roja 19ê Berçele, kewranê termê birêz, ji mizgefta Qasimo- Qamişlo berve Helebê birêket. Li dervayî Heleb, bi sedan heval, dost û berketiyên wî pêşewaziya termê siyasetvanê hêja kirin û tevlê keranê wî bûn. Li ber bajarê Efrînê, dîsa girdek hogir û hevalên mamoste - bi rêbertiya Mamoste **Hemîd Hec Derwêş**, sekretêrê Partiya Pêşverû û mamoste **Mihyedîn Şêx Alî** sekretêrê Partiya Yekîtlî-li benda termê wî bûn , tevlê kewrên bûn û di nav bajarê Efrînê re, berê xwe dan gundê Hopka.

Li binê gund, termê bavê Qedrî yê bi ala wetêt pêçayê, li ser milan, di nav darên Zeytûnan û bi pêşwaziya Koma Folklorî, digihê hewşa malê û di rex xanma wî de-diya Qedrî- tê veşartin.

Piştî veşartinê, pêşkêşvan Rustem Mehmûd, çend gotinan li ser jiyana û xebata birêz dide xuyan û rê dide Gotinan:

\* Gotina pêşî ya hevalê wî yê damezrandina yekemîn partiya Kurd li Sûriyê , mamoste Hemîd Hec Derwêş bi zimanê Erebî bû.

\* Gotina Encûmena Siyasî ya Kurd li Sûriyê, ji hêla mamoste Salih Sulêman Ebdo ve bi zimanê Erebî hate pêşkêşkirin .

\* Gotina Partiya Yekîtlî ya demokrat a Kurd ( Yekîtlî) ji hêla birêz Mihyedîn Şêx Alî ve bi zimanê dê hate pêşkêşkirin û ev e deqa wê:

**Xwîşkino, birano....**

**Nûnerên rêxistin û partiyên Kurd û Ereb....**

**Beşdarên hêja ....**

Rêz û hurmet ji we hemiyan re , ku we xwe gihandiye gundê Hopka – herêma



Kurdaxê , da ku xatir ji mamoste Reşîd Hemo bixwazin, bila hûn xweşbin .

Li seranserî qeza Efrînê , bi her heft nahiye û çar sed gundên xwe ve , Reşîd Hemo dihate naskirin....Ji ber ku , di dema ku dibistan û rê û kehrebe nebû, bi sedan xort û zaro li ber destên wî fêrî xwendin û nivîsandinê bûbûn . Lewre jî, her û her ciyê qedir û qîmetê bû; Ronakbîr, rewşenbîr, dilsoz û berketiyê miletê xwe bû. Li dirêjahiya bêtirî 70ê salî têr xwendin nedibû , tim û tim heyran û evîndarê zanîn û pirtûkan bû , û ji zimanê xwe yê dê pir hezdikir .

Reşîd Hemo ne yê rêxistin û partiyekê bû , ew dost û dilxwazê hemiyan bû , hevalê lihevkerina tevgera Kurd û xebata bi hev re bû . Ji roja roj ve , di wê baweriyê de bû ku, Kurd û Ereb ne dijiminê hev in, û ku Sûriyê bi xêr be, emê bi xêr bin .

Li Helebê, Hezêrana 1957-an , di wê civata dîrokî de , ya ku , li mala Mihemed Elî Xoce , bona damezrandin û aşkerekirina yekemîn partiyeke Kurd li Sûriyê , hatibû lidarxistin; Mamoste Reşîd Hemo xwedî roleke sereke bû . Ji ber ku hê ji berî henge ve , ew digel camêrên weke **Cemîl kinê** , **Osman efendî** , **Nûrî dêrsimî û Osman sebrî** têkildar bû , ji bilî têkiliyên rehmetî bi parta komonîst û komela Aştîxwazan re (أنصار السلم) .

Reşîd hemo , ne tenê li Kurdax û parêzgeha Helebê , lê belê , li seranserî herêmên Kobaniyê , Qamişlo , gund û bajarokên Cizîrê xebitîbû , û li ser riya xebatê gelek êş û dijwarî , geh li hepis û zîndan , geh li çol û çiyayê , her tim cefakêş , xwedî nêrîn û rol bû . Reşîd Hemo jiyana xwe serûber terxî miletê xwe kiribû , lê hertim dilgerm û xwedî hêviyên giranbuha bû .

Mamoste Reşîd Hemo , weke siyasetvanekî mezin , kurdhez , mirovhez û welatparêzekî navdar ciyê xwe di dîrokê de digre . **D.R.(7)**